DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ


https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# STRANÊN MIHEMED ŞÊXO



DANHEV Û AMEDEKIRIN

BEHA ŞÊXO
QADO ŞÊRÎN

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# STRANEN MIHEM
# ED SEXO

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DIYARI

*' KEÇ Û XORT JI MIHEMED ŞÊXO HEZ DIKIN Û*

*YÊN LI DENG Û AWAZÊN WÎ GUHDAR DIKIN*

*' DIYA FELEK ' FELEK '. BRAHÎM ' BIRÛSK.*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# PÊŞGOTIN

*Qado Şêrîn*

*Bê guman Mihemed Şêxo yek ji stranvanên yekemîne di Kurdistanê de. ew berî her tiştî mirovbû û bi hesanî xwe berda dilê kesê kurd, wek dengê req' reqa tavan û şewqa birûskan, deng û şewq daye her çar perçên Kurdistanê dengê wî yê tije pêwendî û gotinên wî yê tijie wate hêjabûn ku wî di dil û ahengên kesên kurd de biçînin.*

*Ew alek bilinde di asîmanê Kurdistanê de, çimkî wî dizanîbû çawa û bi çi rengî bistrê, wî ahenga kesê kurd xweş dinasî û û ji bo wisa bi vî rengê bêzar stra û ev reng ji xwe re kiribû dibistanek, di her çar perçên kurdistanê de mirovek nîne ku wek wî bi vî rengî kare bistrê yan jî dibistana wî bibe serî*

*Wî dizanî ku stran nimêjek bê dawîye yan jî xizmetek bê dawiye ji miletekî weke miletê wî re ku nav û bîra wî bi xwîne, wî ji hemû çaxan re straye, nemaze ji yên ku kul û xemên wî hebin û bi taybetî yên evîndar*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Tenê bi stranan me re nêzîkî yezdanê dilovan û dilê miletê xweye çimkî nimêj û stran me re ji gunehan dison ev stranên ku me nivîsîne tev yên wîne, wî yek strana xeyrî xwe ne gotiye, lê ku goti be jî wî ne xistiye kasêtan de û bi navê xwe belav ne kiriye. dibe di civatekê de, di ahengekê de stra be û yên li dora wî ew starn tomarkirbin wek "Aso" bi hêre destar ' çava kilke ke dolab gerand" û me jî ev stran çap ne kirine û stranin folklorî jî strane wek "Narîn" lê me ew jî ne nivîsîne stranên ku me nivîsîne tev yên wî ne û bi navê wî hatine topkirin, kî stranekê ji van stanan bêjê çi nihabe çi piştî hezar salên dinbe gerek bide xuyanîkirin ku ev stran ya hunermendê mezin "M. Şêxo" ye û ji bo miletê me jî zanibe vî tiştî û dilrastî bikeve karê me yê hunerî de.*

*Me ev pirtûk çapkir ne tenê ji bo vî tiştî, belê gelek sedemên din jî hene, yek jê gotinên helbestên ku wî neqandine ji stranên xwe re bêhtirên wan ji yê guhdar re ne kedîne û gelek gotinên biyanî jî di staranên wî de hene kuyê guhdar bi carekê ne bihîstine û dema lê guhdar dike bi şaşitî pê re dibêje û sedemek din jî heye ku eve awazên wî gelek caran gotinekê dikin du perçe û yê guhdar di vir de jî şaş dibe ku gotina rast binase.*

*Me ev pirtûk çap kir ji ber ku gerek çap biba, gelek kesan ji me re digotin "Em gelek gotinên wî fam nakin(tênagihên)û em dixwazin zanibin bê çi dibêje" daxwazek fireh bidû çapkirina vê pirtûkê de hebû û ev tiştekî gelekî biçûke ku me ji hunermendê xwe yê mezin "M. Şêxo" kirye û ji kesên ku ji deng û awazên wî hez dikin.    Ji bo em bêhtir zanistîbin di vî karê xwe de, hinin stran hene wek "Hebes û zindan" Dibaxan dil' Eman dilo" di hevpeyvîna ku min bi Mehmûd Ezîz" re kir ji min re got:" Ev stran yê minin û M. Şêxo ji min girtin û stran lê piştî ku min hevpeyvîn bi Ûsif Berazî ' Bê Buhar re kir wî ji min re gote " Ne wisaye ev stran bêhtirên wan,*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*gotin û awaz yên minin û hinin yên Cegerxwîn û awaz yên "M. Elî Şakirin û herdiwan "yanî M .Şêxo û M. Ezîz" di demekê de, bi hev re ev starn strane di 1969 1970 " li Libnanê" lê M.Şêxo bêhtir heqê wan daye wan û wî ji "M. Ezîz bêhtir ev staran xweş kirine û ji bo wisa ev stran bi navê M. Şêxo" hatine naskirin û belavkirin" ji bo vî tiştî min hevpeyvîn bi gelek kesanre kirin, ji yên ku di destpêka wî de pêrebûn li "Libnanê" wek Remedan Necîm Omerî ' Bêbuhar' Mihemed Elî Şakir ' M. Ezîz 'Perwîn" Sûriya Mele Ehmedê Husyenî û tevan ji min re gotin "M Şêxo" hunermendekî pir mezine û ev stran herdwan strane lê bihtir bi navê "M. Şêxo hatine nasîn.*

*Di cîhana helbestê de "M.Şêxo" ji xwe re dibistanek avakiriye. Dibistanek taybetî bi xwe û di Kurdistanê tevî de tu dengbêjî stranek tenê ne gotiye û wî mûsîqa kurdî pir pir li pêş xistiye û ji bo wisa wê ev nemir bimîne stranek bê dawî heskirinek bê dawî di dilê miletê xwe de û wê pêre bijî ta û ta hunermendê wisa yê ku gelek caran ketiye zindanan û lêdan xwariye ta ku tu bêjî' ta ku gorên wî bi goştê lingên wî ve zeliqî mane bi deh rojan, ji lêdana pir hingî ku behwerya wî bi netewa miletê wî xurt bû û hingî ku behwerya wî bi netewa miletê wî xurt bû û hingî ji xwe razîbû û ji ya xwe ne dihat xwar ta ku serê wî jêkirina û ji bo wisa ew sergon kirin "Îranê" û li wir jî "Savakan" dev jê ne qeriyan. lê wî jî dev ji stranan ne qeriya, hunermendên wisa tucarî namirin û wê bimînin sax di dil û dîroka miletê xwe de me dixwest em li ser jiyana wî bi firehî binivîsînin lê hûn jî em di danheva jiyana wî de dixebitin, lê yê ku bixwaze kurte jiyana wî binase bera vegere kovara zanîn jimara 4 min tê de kurte jiyana wî nivîsandiye.*

*Bi rastî " M şêxo" bêhtirên stranên xwe di deftera xwe de û bi tîpên Erebî nivîsîbûn û yên mayî ji birayê wî "Beha Şêxo" nivîsîn û min dighertin tîpên latînî me dijwariyeke dît di nivîsandina van*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*stranan de nemazedi yên ku di dîwanên helbestvanan de me ne dîtin, lê birayê wî hunermend "B.Şêxo westabû ta ku ji kasêta girtin.*

*Wî ji helbestvanên her çar perçên Kurdistanê re straye, wek Bedirxan Sindî, Cegerxwîn, Tîrêj, Sebrî Botanî, ehmedê Namî, Bêbuhar, Ehmedê şêx Salih, Rêncber.. û wî helbestê wan neqandine neneqandin tu dibêjî qey helbestvanekî tenê ev qas stran jêre nivîsîne, helbet dengû awazên wî ev reng ji helbestê de dixwestin, û weke wî straye me stranên wî nivîsîne ne wek ku di dîwanan de hatine çapkirin û di bin her helbestê de me navê nivîskarê wê nivîsîye, ya ku me nizanîbû ya kê ye me vala hiştiye da em ji xwendevanan bi hêvîne ku zanibin ev stran yên kêne ji me re bişînin da em di kovarek kurdî de belav bikin ji bo vê yê xwendevan navê helbestvan li bin stranê binivîsîne*

*Di bawerîya min de awaz tev yên wîne, ji ber ku awazên wî tev nêzîk û mînakî hevin û li gelek deveran straye li Sûryê, li Îraqê, li Îranê, li Libnanê û tu awazvan pêre tune bûn*

*Gerek ev stran note kirîbana lê me kesek nedît ku karibe wan bi newitîne û yê ku me dît ku wê bi kêrî vî karî tê em di derîkî teng da girtin û ba da bêrîka xwe lê di pêşrojê de wê tev bêne note kirin û wê çapek nû bi wan derkeve ji bo ev stran bimînin ta û ta û"M.Şêxo" jî bibe çiyak di meydana strana kurdî de, dawî gelek rehme li gora pêxemberê strana kurdî û cihê wî buhuşta mayîye çimkî ew jî pêxembereke.*

*Qamişlo.22/8 1994.*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# EY FELEK

Ey felek bo te dinalim bo çi nêrgiz çilmisî
ew çima bextê me hoye em bê dost û bê kesin

kê dihêt, ma kê dihêt, ew roja min û hewe dît
kanîka arî bizêt jê vexun çema bi vêt

agirê sar û vemirî çav me lêt yê geş bibî
ew buhara hatiye kuştin çav me lêt yê xweş bibî

Bedir Xan Sindî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DI BAXAN DIL

Di baxan dil berim sorgul
wekî bilbil dikim meylê
seher gihan dinalim ez
eman leylê, eman leylê

BI nîşanî, bi şêranî
tilatê rind û xopanî
li te pîroz beşeyhanî
bi bejin û key sem û şeylê

tu leyla ez weke mecnûn
sitem kir pir li min gerdûn
xemê di dil, Dicle û Cêhûn
felek hey lê felek hey lê

tu şêranî şekira miz
bi ken herdem dikî payîz
tu şêrîna li cem Perwîzî
me dil Ferhad û sed keylê

li ser textê evîndara
nesîhayê ji derdora
Cegerxwîn bûm di dîdara
te pirsek lê nekir qey lê

CIGERXWÎN



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## PÊJNA TE NAYÊ

pêjna te nayê, pêjna te nayê
wej ber evînê ez ketme tayê
li ber şibakê ez kûr dinalim
derdê te kuştim kirme belayê
ez her dinalim şev ta êvarê
rondik ji çavê min têne xwarê
lê dost razaye ketye tamarê
lê bê te çibkim xewa min nayê
bavê min çibke em ji hev nabin
diya min çibke em ji hev nabin
yan tevde bimrin yan tevde rabin
şeva li ser avê di bîra te nayê

*Cegerxwîn*

## DUNYA BÛ BUHAR

*Mihemed Şerîf Berzencî,*

Dunya bû buhar xunav hate xwar
li ser geya û gul cejna dost ûyar
Neçe seyranê bejin rîhanê
soz û qirarê te kanî gula dîlanê
ne hate ba min şeng û zerya min
agir berda dilê min yara min ew bû



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# TU WÎ BIHIŞTA RENGÎN

Tu wî bihişta rengîn
gul û rîhan û nesrîn
tu wî jan û tu wî jîn
dîlber tu wî tu wî zîn

ezim Memê dilbirîn
bext reşim Sefîn Hemrîn
Tu wî Sefîn û Hemrîn
tu wî Hindirîn û şêrîn

tu wî baxê sor ji xwîn
tev rondik û derd û şîn
gelek enwar û Gurgîn
şîn û şahîn û bengîn

bijîna biha tukirîn
qelen danû tê perîn
ewin şehîdên evîn
bo te yara nazenîn

bo yezdan sed aferîn
kirim pîrê xem civîn
hiştim melûl û xemgîn
hişta jivanê mizgîn

*Sebrî Botanî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# NALÎNEK TÊ GUHÊ MIN

Nalînek tê guhê min, lê winda û nihane
agir berda dilê min, tev bû pêt û dixane

barek da ser milê min, lê barekî girane
dabûn ser hev kulê min, hemî derd û belane

Kurdistana delalim, her kes tê min dixwazî
ez pir şox û şepalim, min deng daye binazî

ev bûye bist û dusal li ser min cenge bazî
kurdo were mi bixwaze, belê bi ser firazî

xemilanidime seranser, destgirtiya xorta me
gerden sêvik sor û zer, li hêviya merdame

qelen xwîne ne gewher, kurdistana kurdame
bê tang û top û leşker îro we ez berdame

xortê kurdo şiyar bin, guh nedin van ne merda
bav û kalê we rabûn, hemî mirin ji derda

derdê li wan giranbûn îro li me çi serda
ne wek bav û birabin yara xwe ji dest xwe berdan

*Cigerxwîn*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# BÊ XEBAT

Bê xebat û kar û bizav
bê zanîn û rijîm û rav
nabê xudanê heq û nav

ayîn ji bo te kirne dav
talan dikin pê xak û av
her dijmin hêz û dirav

eger bimînî sist û xav
ev taristan nabê hetav
peyda dibî jana zirav

pêşkeve xorto gav bi gav
bi xebite ji dil û hinav
şarebaze û hebe sed çav



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# SERDANA GUNDÊ FILA

çûm serdana gundê fila
carek mi dî li min hila
bê tirs û pirs çûme sila
awir vedan gotî bila
wê delalê sebera û dila
serxweş kirim hal nehêla
bû şeq şeqa dest û tila
mar di reqisîn li ser mila
wê periya ser çeqila
bê hiş kirim jimaç û zila
pêta evîna sor gula
avê te cergê bilbila
piştî cenga til û cila
destê mi çûn nêv paxila
şebnem li sorgulê şêla
dest û hinav ketin pêla



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# XEM Û XEYALÊ TE EZ REVANDIM

Xem û xeyalê te ez revandim
çol û bêlana te ez gihandim
ji ber te sotim tez şewandim
bayê evînya te ez hejandim

dildarê royê di sîngê teme
bi çeleng û çakî mêvanê te me
ji ber fermana te heles teme
sûnd bi serê te, te ez helandim

Dêrsim û Agirî ji taca tebî
Sîpan û Cûdî du burhên te bî
armî, derya Wan du çavên te bî
rondikê çavên te ez pêlandim

Şingal û Bêxêr du biskên te bî
Sindî û gulî kepiyên tebî
geliyê Elî jî devê tebî
şêrîn zimanê te ez bezandim

Decle û Fûrat du kezyên tebî
Kerkûk û Hewlêr du sîngê tebî
Sersing û şeqlaw du lêvên tebî
du awrên çavên te ez weşandim


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hemrîn û Metîn du ruwên tebî
zozik û şêrîn du guhên tebî
Berzanî bi xwe zimanê te bî
li dora cîhanê te ez gerandim

gera cîhan tev hemî ji ber tebî
pêşmergên dilêr nîşana te bî
ala kesk û sor ser sîngê te bî
bi şahî û cejna xwe te ez gihandim

Omerê le'lê

## AZADE ŞÊRÎN

Azade şêrîn, her kes dinêrîn, dê were virde
azade şîrîn, çav westiyan hingî li te dinêrîn

nazik delalê, nûra şemalê, rihnî li balê
tarî di malê, azde rindî, dermanê kurdî

çendî tu kundî azade rindî bona te alem
tev bûn du bendî, çima tu bazdî, daxwazê nadî

azad pirêz got azad te kuştin, te ji derd ne şuştin
di zengê de xistin dîsa te miştin çimkî te hiştin

roja me kurda ma tu nizanî dîsa xuya kir
li ser vê cîhanê pîroz bike wê rûnê li ba wê

*Adil Sêfidîn*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# PÎRÊ XEMCIVÎN

Ez bûm pîrê xemcivîn
bê hiş û mest û jêr nivîn
li dil vebûne sed birîn
ji ber evîna şoxa şêrîn
bilbil civanê gulêye

evîna te ez pîr kirim
bê can û hem bê bîr kirim
bê çar kirim, xem barkirim
şaş û nazan û jar kirim
bilbil civanê gulêye

dilê xemgîn kir êş ûjan
agir berda hinav û can
hey zalimê bê bawerê
ma kanî peymana berê
bilbil civanê gulê ye

*Sebrî Botanî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# AXÎNA JI DIL

Axîna min tim ji dil tê tim ji dil
li min xist merez û kul, xem û kul

hiner birin ji dset û mil, dest û mil
hisret kirin dîtna gul, dîtna gul

şev û rojê dirêjkirin, dirêjkirin
çav ji xewa bê parkirin, bê par kirin

kul û xema bi hev re kirin, bi hev re kirin
ta di dilda xwe bicî kirin, xwe bicî kirin

çav û dilêm bûne gunehkar
her civandin ta kirine bar

ev derdê pir nayên ji mar
xwe berdan ser dil wek kurmê dar

xwedê çawa gul were çê kir
neqşek nema li wê bejnê kir

wextê mi çav dî dil bi xemê kir
herdiwa di dil de hêlîn çêkir



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# ÊMÊ

Ay lê êmê , nazikê nazdarê, ser mezinê
aqil kême, beybûna welatê Diyar bekir
hênkaya welatê Mûşê, sozdara minî,
vî zemanî rabe ême
ay lê lê êma, mi go ez bi yarim tepa şewitî
diketim minê dî li kutlê biya, lê mi dî sê zeryê
mala kalo hat û meşiyan, lê meşa van keçka
nebû meşa hakima qayim qama yûzbaşiya, êmê.

Wele dengê van bê bava, nebû dengê naqosa mifre diya lê bêna van
keçika nebû bêhna misk û emberê, şûşê kolonya bi ser kambaxê gundê me de fûriya, hevalno, hogirno, lê migo bejna êma
hemo tak rîhana devê çême wezê xeşîmim zarome, nema zanim ji kîjan alî, de rabe eêma

*folklor*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# BER DILÊ MIN PIR ŞÊRÎNE

Li ber dilê min pir şêrîne
wek kulîlka bi hilm û bîne
dilê min bûye bi evîne
bê te min gazî û qêrîne

derdê te weke Xabûrim
bê binî û kûr û dûrim
pêlin girin ê din hûrin
li min xistin kirin dûrin
çi Xabûrek bê gemî
wek geliyê du devî

tu ji mir bûye derd û keder
tu car ji bala mi nayê der
wej evîna te nakim der
tuj mir bûye kul û keser
hela were şêrîne
dermanakî vê birîne

kengî li me bê dem û dewran
vegerî li me rojê ciwan
bême cejna her dû dilan
bême bîna gul û baxan
miradê me bi cî were
êşa dila pê derê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

piştî her dû çavê belek
mi hes nekir hîna kesek
belkî li me vegerî felek
herdû dila dîsa bik yek
hela were şêrînê
dermankî vê birînê

## AGIRÊ DERDÊ TE ÎRO SOTIME

Agirê derdê te îro sotime wek piperîk
awirên wan herdû çavan dil vekirne sed birîn

sed derî dadan li ber min ta ku nefhêm dilberê
qet min nikarî bû vekim ez li ber xwe yek derîk

min di destê gulfiroşan dî gulek rûgeş biken
mal û can da bihayê, sorgula geş bê şirîk

min nizanî ku li hawêr wê hene xar û kelem
bûye çil sal ku bi wî xarîve ez mayim xerîk

min dixwest ez bîn bikim wê sorgula nazdar û geş
lê ji destê min revandî sorgula min ser serîk

*Cegerxwîn*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# GEWRÊ

carekê mi ji xwe rẹ dî gewrek
çavê wê reşî belek
xwe berda nav dilê min
min jê hes kirî gelek

ez û gewrê bûn dilek
bûne rih'ek, bûn canek
tucar gewrê jibîr nakim
ji niha û sed û salek

hat bîra min birh û çav
lêv û diranê li hev
bejn û bala te zirav
porê tarî weke şev

nesîbê me tev nebû
ne bi destê min û tẹbû
xêr nexwaza em dûrxistin
lê dilê mi li cem te bû

binêr li min û vî halî
ji eşq û xema ez dinalim
wextê çavê min li te ket
keser xwe ser da alî

*Kemal Şanbaz*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MIHEMED RONÎ

Mihemedo ronî minê çi ji te re got û tu xeyidî
ava gola li min û mihemedê mi cemidî
giyakê çola li min û mihemedê min seridî
heçî neqeba herdû dilê şêrin xera bikî
lê heger xort bî bi ciwanîka xwe şa nebî
û heger qîzbî tucar ne zewicî
û heger jin bî tu car ne welidî

**Folklor**



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# EXÇÊ GULA

Ez çûme nav bexçê gula
zanim ku min berdaye rê
guhdarê dengê bilbla
ez xweş di zanim vê sirê

ev reng û deng û av û dar
vê kir li min xweş kir buhar
anîna ber çavê me yar
ketme xeyala dil berê

ketme xeyala hûr û kûr
awir min avêtin li dûr
nake li min bû şewq û nûr
dilber ji bircê daye rê

derket ji nav Bircê meşî
ava çema qet ne xweşî
sorgul ji ber şerma weşî
ez dame ber yek awirê

*Cigerxwîn*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# EMAN DILO

Eman dilo eman dilo
ji derdê yarê tibi kulo
janê eşqê avêt dilo
dil û kezeb tev bûn kulo
Yar bû gulo ez bûm bilbilo
jinav bexça meşî û birêket
por wek herîr li ber bê ket
canê min ma û dilêm pey ket
dil wek tîr û tevan lê ket
ji serê min çû hiş û aqilo

Ji nav gula derket meş tê
wek horiya li nav buhuştê
ji gulan hilm û bîna xweştê
min dî kember daye piştê
ji hêsra hinarkêm bûn şilo
di ber mire bihûrî dimeşe
yek li ber min kir wek reş
li pêş min kir şeva şeşe
ez bûm wek birîndar ûnexweşe
dil û kezeb tev bûn kulo

*Mihemed Elî şakir*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## PÊŞKEVIN EM SERFIRAZIN

Pêşketin em serfirazin miletê kurdî
yan mirin em dê bibînin yan jîna kurdî
wa miletê kurdî

ala rengî bote deynim ger ser biderdim
ger nekim bê tu bizane ku ez ne kurdim
wa miletê kurdî

xwendevanim ûxwendegahim bê alû leşker
dê bijîn paşî bizanin rêçê bibin ser
wa miletê kurdî

Kurdistan êdî menale lawê te hatin
xwendevan xwîn firoşê axa welatin
wa miletê kurdî

mal û dil û can bi carek bo te fîdakim
xwîna xwey paqij dirêjim bin destî nakim
wa miletê kurdî

*M. Ehmedê Namî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# AY LÊ GULÊ

Ay lê gulê gula minê
şêrîna li ber dilê minê
gulê nadim bi malê dinê
wel ser gulê têmkuştinê

Gulê kesk û sor û zere
nîşana alê li sere
êdî reng sipî gewhere
şêrîn û peymana minê

rengê teyî pir delalî
bilbilê li ser te dinalî
te nebînim bi vî halî
amanc û kedera minê

zordar dibê ez gul nadim
ezê zend û benda badim
ezê kelh û sera radim
azad dibî bi şoreşa minê

bi xwdê ez pismamê te me
bê sûnd û pesindarê te me
ser ceng û hawrê te me
qelenê te ji xwîna minê

*Omerê le'lê*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# KEÇA GUNDA ME

*Ebdul Ezîz Sefer*

Ez keçim keça gundanim
kulilka serê lawanim
rîhana rez û çemanim
lawiko ez birîndarim

Delalê tu xwîn şîrînîê
dilekî lêv hingivînê
mij xorta gava midibînî
bêriyê wez evîndarim

lawiko evîndarî şerme
gelekî bi tirs û serme
evînî gunehe li cem me
lawiko ez bêrîvanim

delalê bejin rîhanê
kulîlka heyva gulanê
bizane xweşya jiyanî
bêriyê ez evîndarim

lawiko were mala me
mi bixwaze sehke kula me
gustîlkê bike tila me
lawiko ez bêrîvanim

delalê bêje bavê xwe
min bide û dewlet serê xwe
qayîlke delalê dilê xwe
bêriyê ez evîndarim



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MIN BIHÎSTÎ TI NEXWEŞE

Min bihistî tu nexweşe
çibikim bextê min tim reşe
dilê min herdem bi kule
carek ne bûye geşe

delala min tu pir têşî
derda xweji kesîr nabêjî
bendî te mam ez hiliyam
tû kulê xwe jimire bêjî

nayêm ba we li min negrî
çima wilo tu bê sebrî
evîna te ze hilandim
ma sozê te heta kengî

hêstir ji çavê min tên xwarê
wek hûr xunava buharê
alem tevde dikevin xewê
çavê mi ji bo te şiyarin

*Kemal şembaz*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MIN CANÊ DÎT

*Mistefa Artûşî*

min canê dît bi çavêt zil
min yarê dît bi dilê kul
war û hêlîn bûne kavil
min tu hêlayî belê nej dil
Dil vîna min dil vîna min

Ji nav baxê ez hatme çinîn
dûr ketim ji warê şêrîn
kilêz bêt jîna bê hêlîn
bê awaz û cejn û narîn
dilvîna min, dilvîna min

Bigrîm bo xo ya ji bo te
li ser xora sotimbo te
sûnd bi kavil û wêraniya te
dilber nadit evîna te
Dilvîna min, dilvîna min

Kaniya te av jê firkirî
te nedizanî ya dav kirî
te girêda çav û perî
xewnbû go tu serda birî
Dilvîna min, dilvîna min



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

qalka zilka her belavê
berbay çûye ber ba û vê
şerme li destûrê ravê
du car bikevî yek davê
Dilvîna min, dilvîna min

Were guh bide vê pestê
ezê dijîm çerxê bîstê
ger liv livîm dibên rastê
bo nexweşbûm ketme xestê
Dilivîna min, dilvîna min.

## BILBILO

Hay bilbil ' bilbil bilbilo jaro
hay ' hay bilbil hay bilbilo
le çima carekê li baxê mi rû nake şil
le çima bi awaza xweş nakî dil
hay hay bilbil bilbilo jaro
le tembîka min li tebê tê tucar û tucar
hêlîna xwe çêneke li ser dara bê gul
le dara bê gul mîna evîna ne ji dil
zewaca tev kul

*Dr Feydella Xiznewî*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# CANA ŞÊRÎN

Ey can canê cana şêrîn
te dû pisyar ji min kirîn
car revandin car koçerîn
nizanim kê em ji yêk kirîn

sipêdê ta roj çû ava
ta ku heft nîve ket şeva
her ez bûm¸evgerêt şeva
ez bûm per canê van çava

revendim ez revandim ez
revandkî bi lez û bez
yê bê reşmal û koz û pez
ji dîtina te têrnabim ez

ma te çend keç hilbijartin
te bi destê xwe veşartin
çend ser haṭî bi ser te hatin
ma te bo çi qîz negirtin

*M. Ertûşî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# RABE JI XEWÊ

rabe ji xewê çavê raketî
dilêm şewitî agir pêketî

şêrîna min çû tu dil vêketî
dêçi bikim îro ji dest min derketî

şêrîna min bir zalim neyara
ez mame feqîr, mam li ber dîwara

ez bandikim qêrîn hewara
kî ser hêlîne, kî ji xew şiyara

ser min zivistan ka buharê min
şêrîna min ket dest neyarê min

wê li min qut kir ziman, zarê min
li min xopan kir şûn û warê min

çi deng bê ser min ji biharê dila
ku bê guhê min dengê bilbla

ez wê hilgirim ser herdû mila
ez pê dermankiim derdan û kula

*Bê Bihar*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# HEBS Û ZINDAN

Hebs û zindan kûr û tarî xewa min nayê
ji eşq û evîna gulê ketme belayê
gula min vebû bînda serê çiyayê
min go gula min were vir gul bê dem nayê

gula min rengîne, gula min geşe
gula min bi xelkê tahle bi min pir xweşe
dunya li ser min rûn dem li min reşe
dest ji gulê bernadî ku xwîn bi meşe

gula min kesk û sor heyran, gula min zere
hebs û zindan da riziyan gul bê xebere
gula min bindeste heyran bi kul û kesre
dest ji gulê bernadim can bi dim sere

gula min tu xeyidî min guneh çêkir
te ji min re çi got û mi bi can û dil dikir
min mal û can da ser dîsa hindikir
riya min gelek dûrbû va işqê kin kir

*Bê Bihar*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DI XEWDA

Di xewda ez çûme şûn wara
nale nalê van dil dara
ax û ofê evan yara
nedhat dengê van dildara (şivankara)
Leyla rabû xwe di me werkir
go dildara te çi li min kir
te dil fêrî dildarê kir
te ez hêlam te xwe ker kir
leylayê çi di mi nehêla
giyanê min xirtik şêla
min go diçim wê nehêla
gêrandim ser kavil ûkêla
go baş bû tu çawa hatî
başbû kesî tu ne dîtî
xwezî bisaxya xwe min didîtî
gerdena min te tê mêtî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# ÇIBIKIM BI CAN

*Bê Buhar,*

Çibkim bi can piştî herê jîna ciwan
bexçê me hişk tê da gulek nakê xuyan
qutbî ji ser îro çima ava jiyan
avnê ji Bîngolê û kanî, serheda
tew deng ji şalûl û qumrîya
tenê geryam li nav tiştek ji minre tênê
tê de biyanim ez bêm raz wermam tenê
tiştek ji qelsan dibên hêvî xweda

warê me ket destê çeqel, rovî û gur
wana li hev û parkirin war bir bir
jîna minî mayî tucar nabêm şukir
ferman ketî dest bêcirên pîs û gede
îro ezê dîl û reben, bend û benî
derya xema ew kûre, pir ez çûm binî
pir zad min çand,avda bixwe dujmin çinî
hin jê mi xwest, dujmin ji zad kulmek neda



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

şev reş li pêş min bû hemî tûk û kelem
destê sitemkar wî dilê min kir elem
dujmin wekî şah nadirê şahê ecem
ê hatî ji min kuşt wî tucarî keys neda

destê dua hêvî ji wan nakim tucar
ez çek bidim xortên heval merd û şiyar
mam bê bihar bînim bi zorê xweş buhar
min dî bi qelsî qet kesî tiştek neda

## WERE WERE LI NIK MIN RÛNE

wer were li nik min rûne
dilêm kule bi kewîne
eger rojê ez te nebînim
hemî dema li min girîne

were wer reng esmerê
wek kulîlka li pencerê
şev û rojê di xeyalê de
dil û hi navê hatin derê

were were çavê belek
wê xwêdana pirça xelek
tu bi xwedêkî ji nik mi neçe
kulê dilêm bûne gelek



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# NESRÎN

Demê min tu dîtî Nesrîn
herdû çavê di reş digrîn
ewan çava digote min
careke dî tu min nabîn
dil û can min bibîne xwîn
ji hemîla min vebîn birîn
ji ber şenga diran zêrîn
ji ber şoxa bejin şêrîn
te dêm tê kil berf û xwîn
tu ji gula bûyî nesrîn
buhar behî û nesrîn werya
kevne nêrî li ser çêrya
heyfa min têtnesrîn birya
rondik weryan ser wan rûya
ew çavêt reş gelek girya
nesrîn xwezî te bibînim
tû şîn dibî careke dî
nej wê binê ji bineka dî
ne ji warî ji warekî dî
xwezî çi car nehête dî
eger bêtin bi rengekîdî

*Xelef Zîbarî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MIN CAREK DÎT L

Min canek dît li nav çiya
ronahî da çar aliya
rawestam bin sîha piya
nexweş bûm ketme ser ciya

Hişyarkirim qêjîna wê
min xwe avêt ber piyêt wê
ber perekî mezin yê vê
min jî guhda gazinêt wê

ne saxeke giranim ez
ya bê pirs û dermanim ez
bê xudan û sexbîrim
ya bê bab û semyanim ez

Ferhadim ez şêrîna min
wey te xwelî bi ser serê min
wey nazik û serbara min
kul û gazinda neke ji min

kaxeza ji kêre biweşînim
perda kî şêxî bi hejînim
ser kêleya kê çakî rûnim
dermanê te ji kîrê bînim



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# PERÎT ROJÊ

Wa perît rojê hûn min ne hêlin
min jî qenc naskir xirfen û fêlin
çi rêka min girt derket kore rê
çi barê ez çûmê bivok û pêlin

xewa min nahêt şeva girane
xuh û xwîna min bûye erzane
şeva dirêje digel kê rabiwêrim
yar hev min nîne ceger talane

yarê ta kengî jîn bê te sarbit
gula digvêşin ta gulav hebit
me çend ber milêt gula guvaştin
bo hizreta me ev rû gulavbit

ezmanê lal bit bera her nebit
jîn bê serbestî bela vêran bit
çavêt girêdayî bela her nebit
destê kurt û teng bela her nebit

derb bi kîlin mirin tê nebit
dê gehî nete dujminî nebit
sexmera tîta ev ro meşextim
raste meşextim dil meşext nabit



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# CIWANÊ ' CIWANÊ (GAVA EZ MIRIM)

Ciwane ciwanê tu ciwanî ciwanê
min nedît ciwanî husanî ciwanî
dibêjin perî paşe ew kanî
diyare tuwî ey Kurdistanê

kela hevînê, zora bilinde
warê seyrana xoşî her rinde
kesê bê bên bêt naçîte serê
hemî dirkin rê kavle gunde
kesê çû serê diçînit gula
kesê virsiya gur bû dilinda

Gulê xwe xemiland xemla bîka
min gul ne niyasî li nav kulîlka
gulê ji dinê ez bê par kirim
nazdar ferîzbû bin siha mîga
gulê dil min kir paytextêt xo
rûnişte xwar ser hev wek melîka

gava ez mirim gelî zindiya
min ne veşêrin wekû hemiya
gorêt min çêkin binsîha çiya
kêlêt min çêkin ji dû keziya
hemî adara hûn min şiyarkin
da bikme sînî jibo me hemiya



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# YADÊ

Yadê rebenê roka me hilatî ji aliyê çiya
şewqê avêt nav bax û mêrga û kaniya
xortê kurda rabin roja we hatiya
kal û qîz û xort rabin de em herin serê van çiya
de emê binêrin li van çîçek sorbûn ji xwîna van kuştiya
ax ax li min ay ay li min halê min tunîne

yadê rebenê emê birîndarê xwe dermankin şehîdê xwe veşêrin
emê sûnd bixwin bi qadî Mihemed bi şêx Se'îd xewka me nayê
ew kul ji dilê me der nayê heta em ala rengîn nebînin ser zozanê kurdistanê hildayî
ax ax li min ay ay li min welatê min şêrîne

*Kemal Şanbaz*

# EZ DERBÛM

Ez derbûm dinyayê bi şîn û bi ser
ez bûme xerîb geram der bi der
felek roja min çû nehat û nema
te ez berdayîme deştan û çema



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# KEDERA MIN ÇENDÎ CIWANE

Kedera min çendî ciwane rengê gulê
sor û renge, kesk û şîne xemla mi lê
mi gazî kir xweş limin nerî got min belê
li min kerkir cerg û mêlak tev û dilî
peymanek da li min hejand bisk û gulî
burhên kevan tîrên çavan berdan dilî
berê min da serê çiya binya gelî
li wan ber ava, co û ava gelyê elî
seyrangeha xortê ciwan nû ewilî
destê me lev em lê geran ji nîva dilî
keç û kurên kurdin ciwan reng xemilî
hin ji Tirka hin ji Îran Sûrî û gulî
lekin paşî ji Sûrya gihan nû têkilî
bihev re kirin kêf û şahî reqsa milî
dêmahiya xatir xwazî kirin gilî
keder û kul te revandin ji nav dilî

*Omerê lẹ'lê*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# XWEDA HAFIZ

Xweda hafiz xak û welat
gerdena te aza welat
gerdena min tu azakî
dinya mêrg û mirina welat
dil perîşanim feqîr û jarim, bê kes û karim

min ho nevya bes hosa hat
tu li min heger xak û welat
min reş geş kir min nan nebat
xweda hafiz xak û welat
dil perîşanim, ferqîr û jarim, bê kes û karim

ez zanim hûn bêrya mi dikin
yê bi şev û roj hizra mi dikin
agirê xwe hûn hil nakin
elboma min herdem vedikin
dil perîşanim, feqîr û jarim, bê kes û karim
kes heye vê gulê bo min
bighîne destê dayka min
mizgînê bide yara min
gulê nîşana saxya min
dil perîşanim, feqîr û jarim, bê kes û karim



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

herdû pêkeve da tên dinê
herdû vêkrê daybîn kinê
wê herdû tim bi min bêjin
dabim bêjim tew ya binê
dil perîşanim, feqîr û jarim, bê kes û karim

## ŞERMÎNE DIL

Şermîne dil dê çawa şev çirakim tariya
bo dê bêjim, har û gêjim dil verêjim, min viya
lew şêrînê, nazenînê em ketin derdê girînê
rewşaa şoxa dila, xanzada textê evînê
ew buhara li dêmê riştî lê belavbin lal û gul
lew di xwînit kew bi sohtin hêr û jana ev ro dil
ger me zanîba tu çi rengî, da bîna me hêt
ne torîn û ne perî ne meya me ji dil divêt
sed hezar torîn û perî bibne gorî te delal
çi meya ji lêva dibarit, bi rengekî sor û zelal

*Bedir xan Sindî*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# IQBALA BELEK

Li çil ûşeşê xwazgînî hatin
li şêst û yekê berbîkî hatin
binkê dildariyê dîsan medana
iqbala belek palek wêrana
hat xwazgîna min parta dîmoqrat
sîh û sê hezar şehîd da xelat
Dawet kirêt min ave bûn bira
xêzvan û cotayar û pale û dektora
lawçet bîrêt min ne hêzevan bûn
xwendiyêt min bîst û yek hêzbûn
ez bûme derya ji xwîna şehîda
gemiyek wan çêkir ji hestiyê şehîda
xatir ji min xwest van genc û lawa
bê hizir û tekbîr nizanim çawa
dîsa bizyabek davêt perya min
dîsa agirek kete dilê min
vê parta delal hevala ez xwestim
belê dijminan va ez guhestim
va ez guhstim bêkes û semyan
bê xeml û rewş û awaz û dîlan
dîsa hevalên xemla min behî
dîsa min şîniyê nîhar û behî
dîsa ji nişkde ez bûm yara xelkê
dilê min rawest hawar te kengî
tu min ne hêle ez ketme bextê te
ez her dimînim li civaniya te



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# TU WÎ KEWÎSTAN

Tu wî kewîstan ezim kevî
dildarê te me wî bi navî
sed keç bêne biperya min
ji dilê min der nakevî
sed keça ez bo xwe bînim
dê navê te her vexwînim
nîşanê te ez na birînim
kesî wek te ez nabînim
ez dê keça xwe bite navkim
bo me tê te dê em lê berkim
her çar aliya ez ê zêr kim
dê mamîka li rexa helkim
kurê min rapête piya
keça min jî bête şiya
li kê raşkin van axiya
tê bi mîne ser vare hemiya



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DEH Û YEKÊ AZAR

Deh û yek azar cejna azadî
bîst û yekê wê newroz û şadî
bi xêr bê buhar newroz û adar
xweş dibî bi wan dilê evîndar

agirê newroz li girê yare
hilbû bi şadî mangê adare
mêzeke îro li guhê laleş
rûdêmê keça mîna gula geş

pêşmergê nebez dara azadî
avdan bi xwînê bi şad û merdî
silav her li wan li deşt û çiyan
xwîna xwe rihtin le boyî jiyan

qîz û xortên kurd çeleng û çakin
bi awaz û deng wa tim di bakin
zengilê jînê newroz vaye hat
rojek nû hilat pê xweşbû welat



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# KOÇÊ ME BAR KIR

*YÛSIF BERAZÎ*

Koçê me barkir danîn li zozan
ew pir bi min xweş tev mêrg û çîman
hatin ji dûr da wan pir vegirtin
dujmin li dor min çadir û sîwan
Rimbaz ji dijmin wan rim hejandin
hatin li ser min wan şer gerandin
ez bûm birîndar tev ga û pez çûn
sorgul û nêrgiz wan tev weşandin
dotmam li ser min hatî girîye
gotî bi min re halê te çiye
kolak ji dijmin dotmam bir û çû
kes pê nizane wê bi kud bifrîye
min çav vekir ax ma ev çi dewran
torîk û rovî zorkir li şêran
heyfên li lawê Ristem û Xusro
werman di xewda qut bûn ji wêran
rabûm ji nû min kir qîr û hewar
piştî ku ez mam bê cî û bê war
dizên reşik xas toran û Îran
girtin ji min war qut bûn li min zar
dev za û tî bûm bîn gol û jiyan çû



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ez wer nexweş mam diktor kuda çû
wek min gelek çûn tevda di vê rê
namûs nema wer ket bin nigan çû
Tevde ji destên xapok û oldar
rihnî li min bû tarî û êvar
meydan çi vala ma wer bi dujmin
derdek li min bû tarî û êvar
zarok biçûkin ez wan şiyarkim
xwendin li wana tev de bi barkim
heyfê mi rakin dujmin belakin
bûm Bêbuhar ez rabim nû warkim.

## XAÇA SOR Û ŞENG

Em belavbûn li cîhanê kanî xaça sor û şeng
bo bê dengin, bo bê dengin, jîna meya bûye ceng

kanî ew mafêt mirova bêt bibînit me kurda
kanî mafêt kurda bêjin bo meşxet bûn van erda

ka civata aştiyê, ka bêt bibînit rastiyê
bo nahê te behya me bû, wer bibînin şîniyê

ka civata mileta, ka çi sehim bo nê bû nema
yê bi hêzbit û heyîbit, ma ewe şahê dema

# XORTÊN MELÊ

Xortên melê ne bê jimar
gêwên ne hingin nav û dar
serbestî û azadî kar
xwînê dirêjin bê hedar

kurdin me azadî divêt
xwînê dirêjin bo welêt
sûndê divên xew li me nebê
heya ji cî rakin neyar

ew hêvî û gazî bikin
ger em nebin dost wê çi kin
derdê bi dest derman nekin
ger em bimînin bendewar

hingî me go em westiyan
heya bi çînê em gihan
dengê me çû koma cîhan
kesik li me nabê şiyar

ala bo aştiyîya li dûr
Berzanê me hil;dane jor
yan bêne kuştin tev li dor
şerme ji vê em bêne xwar

*Ehmedê şêx Salih*

# DI ZINDAN

Mihemed Şêxo

Di zindanê dinalim ez
sibêde heta êvarê
çava vedikim te nabînim
tuj min dûrket şêrîn yarê
evîndarê tebûm dînê
va îro tu mi di hilînê
çav rondika dibarînê
dil bi çavre dinalînê
tu gulbû min tu bîndikir
çiqa gava ez hatim hundir
tu dûr ket te dilê mibi xwe re bir
tenha te ez hiştim şêrînê
dikim derim ji dinyayê
ka soza ku te bi mir dayê
te hewara mi his nayê
gelo tu ji kû di axînê
axîn min û te bi tenê
çare tune jêre li dinê
me dost nîne li vê dinê
cergê me suht vê evînê

# EZ BÛM FERAR

Ez bûm ferar dûrbûm gelo ji yarê
qet dost neman tev bûn neyar bi carê
dewran limin ew çep gerî lipaş dibarê
Bûm wek gumok hêsirên min tim dibarê
ez wek gûyîn tim roj û şev dinalim
ez mam biyan bêkes û bê şev dinalim
ez bûm wekî kalê temen buhûrî
rê dûre bi meş ta qet nema û nikarim

dinya zivistan pir bi ba bahoz
berf sipî sar tê bi mij û tev toz
şev reş û qir şaş bûm ji rê bi der çûm
kopal min girt piştê me xwar û pir xûz

birçê û tî derdê giran bi ser de
sersem û gêj şaş bûm herim bi kurde
pir dem wekî Mûsa li Tûr mi bakir
carek xweda min qet nedî te cabda

tae't, nimêj ma ey xweda ji bo çi
jîna me tev tae't mi kir bi qencî
dawî temen ez mam feqîr û bêwar
ez wer nexweş bêkes hejar û birçî

barê giran îro çima li ser min
tev rê tewer şaş kir hemî liber min
yarê kirim wê Bêbuhar te yar da
dil xweş ne kir derd zêde kir ji bo min

*Yûsif Berazî*

# WELAT

Hey welat ' welat pir şêrîn welat
taca cîhanê xemla roj hilat
tev petrol û kanî û darê zêr zewat
li nav te xabûr Decle û ferat
di nav te dene bajarên bişan
yek Waş û kanî, paytexta Mîtan
yek jî amedî, paytextê Mîdiya
yek darê Ekmîn ferman û berat
ji nav te rabûn Keyxanên bilind
Wek Keyxesrewî Restem çend û çend
wan ferman kirin ta Yonan û Hind
wan ava kirin pir birc û kelat
ew dîlawerna lawê te kurd bûn
gelek jêhatî mêrxas û merd bûn
xwedan serbaz û xurt hêz û cergbûn
dujmin ji dset wan tev de man sermat
gelê li dor wan xulamê wan bûn
ên tazî û pêxwas, hov û nezan bûn
birc û kelên te bi wan wêran bûn
li te fermankir ê ku ji dûr hat
nevyê te ketin bin destê neyar
îro bûn rêncber birçî û hejar
gel tev serbest bûn em kurd man bêwar
wer bê Buhar man dema me nehat

Yûsif Berazî

# KOÇÊ ME BARKIR

Koçê me bar kir danîn li zozan
ew pir bi min xweş tev mêrg û çîman
hatin ji dûrde wan pir vegirtin
dijmin li dor min çadir û sîwan

Rembaz ji dujmin wan rim hejandin
hatin liser min wan şer gerandin
ez bûm birîndar tev ga û pez çûn
sorgul û nêrgiz wan tev weşandin

dotmam hat li ser min hat û girîye
gotî bi min re halê te çiye
kolak ji dijmin dotmam bi r û çû
kes pê nizane wê kud biriye

mi çav vekir ax, ma ev çidewran
torîk û rovî zorkir li şêran
heyfên li lawê Rustem û Xusro
werman di xewda qut bûn ji mêran

rabûm ji nû kir qîr û hewar
piştî ko ez mam bê cî û bêwar
dizên reşik xas, toran û îran
girtin ji min war qutbûn li min zar

dev za û tî bûm bîngol jiyan çû
ez wer nexweş mam diktor kude çû
wek min gelek çûn tev de di vê rê
namûs nema wer ket bin nigan çû

tevda ji destên xapok û oldar
rihnî li min bû tarî û êvar
meydan çi vala mawer bi dijmin
derdek li imn vala ket pirêş û dijwar

zarok biçûkin ez war şiyarkim
xewndin li wana tev de bi barkim
heyfê min rakin, dujmin belakin
bûm Bêbuhar rabim nû warkim

*Yûsif Berazî*

## SÎNEM

Lê lê Sînem çiya bilindi ez te nabînim
erê bê bavê dînê mi go mektûbekê bişîne
Cezîra Bota ji bo ez bi xwînim Sînem
heger tu nexweşe ez textorim û hekîmim

*folklor,*

# HO DAYÊ' DAYÊ

Ho dayê dayê cegera teme
her çanbde îro wer dûrî teme
her gav û herdem li bîra teme
wez keterbînê qenciyê teme
ḥêviya min ewe ji te wa dayê
xuşk û birakêd min hoşyarke dayê
Keç û kurêt min hoşyar key daykê
danê zivistanê cegerê daykê
xuşk û birêt min keç û kurêt min
eger ko te da kanî kekêt min
dsetê xwe daykê bi serîda bîne
jêre bêje va ew serhatiya min
bêhna Qeladizê bike kepêt wan
du kêla de kan bike çavêt wan
hingîna sertîz bike guhêt wan
derya xirney bike dilê wan
divya jiberkin ewê dîrokê
çaxê qeyrebûn bêne berrokê
ji bo hem çeka çend parçêt top
tû bike meyze cegerê daykê

# VÊTNAM Û KÛBA

Tolazêt kurda hûn rabin hestin
Vêtnam û kûba ev ro serbestin
piştî me hatin, pêş me gihştin
vêtnam û kûba heval û dostin
gelî rêncbera û netwêt bindest
hing bimrin serbest bes nejîn bindest
dujmin û dostê xwe ji yek binasin
bes bijîn jar û bes bijîn bindest
kak û şivanê bê kes û jara
xuşkê rêbert pale û cotyara
gelo rênasêt evan rêncbera
her ê ketiye pêşveçûn bira
Kurdo ne jîne, kurdo ne hêlin
em xebata xwe çi car nahêlin
keç û kurd pêkeve dê bese rabin
bese nakokî gelo hişyarbin
gel hevalêt xwe desta tê girtin
bir kuştiyê bese bihêlin
pale û cotyarin bê kar û warin
xwendekar, belengaz gelo rêncberin
dê rabin vîkara wek xuşk û bira
rehêt zaroka da ku nehêlin

# DERDAN ÇI EZ DIL JARKIRIM

Derdan çi ez dil jarkirim ey felek
êdî nikarim ez bijmêrim bûn gelek
barê xêzanî jî li min hîn nebes
serdar ji pîsara çi ez bûm hinek
mêrê gemar îro hemî pêşketin
karê nebaş îro ji war paşketin
kûçik bilez kom dibin
mêrên durust nabin xulam paşketin
wê tuşt nebê parek ji çem qels´dibê
bahtê gemar dajo li ser kom dibê
lê qet gemar avê çema nagirê
av xurt dibê dajo gemar pak dibê
zanî bi birçî û bê war û jar
lê baz tucar nabin xulam ey felek
**zanî tucor nabim xulam egfelek**
tim bergerim razîme ez Bêbuhar
cardî xeman wan dest li min dane hev
pêde bi lez ew tên bi meş geh bi rev
piştî ku ez bûm Bêbuhar nakevim
dem bê bi cengê ez bixim ji hev

*Yûsif Berazî*

# WEY LÎSKÊ HIZIR Û BÎRÊT MIN

Wey lîsk **Higir** û bîrêt min
bînahiya her dû çavêt min
dê bi cî bîne daxwazya min
car davêt ew pirça berdayî
wekû reş marekî hildayî
hindav ew bejna hiljişyayî
ta bo min bike diyarî
dê bo xwe kim yadkarî
da jibîr nekim vîşarî
dêkim têl bo tembûrekî xo
dê pêlêdim awazê xo
da ji te re vekim dilê xo

# ŞÊRÎN TU CÎNARA MIN Î

*Bê buhar*

Şêrîn tu cînara min î
amanc û nîşana minî
ronî û rewşena minî
bax û gulistana minî
çavên belek lêvên şekir
dêma gulî bisk lê şekir
bejna te min lê meyzekir
derya evînê çûm binî
pêlan li ser pêlan veda
derbêm ji bin qet keys neda
vînê dilê me şax veda
qey dil diyanî dujminî
mihrê tu bik êdî gidî
davan li min bestim vedî
min qet li dinyayê jî nedî
zû dilrevînê şewşenî
sorgul buharê geş dibê
cîhan hemû pê xweş dibê
havîn li pê tê hişk dibê
hew hat ji nişk de bêçînin
ez gulîstana gula
pêxweş bikim derd û kula
şev reş bû ruhnî hila
mi çi ji xwe re gul çinî

# FERYAD

Feryad û sed ax û eman
ez ketime ber êş û bela
heyfa evî umrê ciwan
min daye ber derd û kula
derdan ji dil min dane şax
Nîsan li min bûn wek Tebax
mêrga dil û can çelmisî
hişk bûne hewdê sorgula
hişkbûn li dil mêrg û çîman
teyr û tilûr qet tê neman
îro ji wî baxî bilî
awaz û dengê bilbila
şalûl û ilbil mirxê baz
qumrî quling, şahîn û qaz
tev jê firîn derketne der
ma warê bûm û qertela
Tîrêj bese qîr U6 hewar
e'mrê çûyî lê nabe çar
kêf û xweşî îro li dil
bûne wekî salêd xela

*Tîrêj*

*Têbinî: lê lê ciwanê nemir Mihemed Şêxo ji cem xwe.bi ser vekiriye, bi destûra helbestvan Tîrêj*

# RABE GULÎSTAN

*Mihemed Şêxo*

Rabe gulîstan ez tu' bi tenê man
biçin seyranê li nav mêrg û çîman
    seyranî xoşe demê buharê
    li nav gul û geyaû gel sêrî nyarê
xwezî û sed xwezî jiyan kirasba
gava min nevya mi ji xwe avêt ba
    warê serxweşa cê warê minba
    yara dilovan li tenişt min ba
yarê buhar hat xemla gulane
eva buhar hat ne zivistane
    yar hizreta me dîtna dostane
    kula dilê me ev niştimane

# RABE PISMAM

*Bê buhar,*

Rabe rabe pismam rabe
pismamo ji xewê rabe
rabe xew ji mere nabe
                    rabe rabe pismam rabe
ev dem ne dema xewêye
ev dema demê cengêye
va leşkerê dujmin têye
                    şer li ser namûsa teye
dujmin kete çol û çiya
girt ji bajar û gundiya
zindan dagirt ji girtiya
                    va agir berda xaniya
mêrxas gelek hatin kuştin
zarok di erdade biriştin
em dest valane hûn piştin
namûs li welat ne hiştin

# EMAN

*Yûsif Berazî*

Eman eman eman
ez bûm warê xeman
ketim ber mirinê
tewr nagere ziman

bê ziman û zarim
dil bi êş û jarim
ji lêdanê evînê
deng kim ez nikarim

zindan kûr û tarî
birçîbûn û jarî
nan bê xwê av bi xwê
kuştin û neyarî

ev cejnê nîrozê
evînê kir wek dojê
gelî kurda rabin
hûn tev bikin dozê

Amedê bindestan
paytextê kurdistan
ji xortê kurd zanre
evîn kir goristan

# ERÊ ŞOXÊ

*Tîrêj,*

Erê şûxê erê canê
tu wer dam biçne seyranê
ji xwer carek temaşakin
li vê govend û dîlanê

ezê çibikim ji govenda
ji dahol û ji sazbenda
xem ûderdên mepir kûrin
ji rengê geliyê Sîpan

kul û derd û xema bavê
wer da em biçne ber avê
go dengê bilbilan guhkin
di nêv baxêd gulîstanê

bi şêrê dê bi serê bava
tu car ez naçim berava
dilê herdem bi kul bême
wê çibkê ji bilbilstanê

tu bi qedrê mishefa reşkî
bi ro û heyv û ateşkî
tu guh med gotinê vala
wer da em biçne meyxanê

bi xerqa û bendek û laleş
bi zeradeşt û bi arê geş
bi wî kalê veşirtî ez
tucar naçim di meyxanê

# DESTÊ MIN BIGRE

Destê min bigre pir xweşe cîhan
da em derkevin serê van çiyan
gulê ser şaxan tev de va vebûn
ez û tu hîna mane perîşan
destê min bigre tucar bermeda
da em derbaskin bajar û gunda
dostê me pirin livê jîna xweş
lê wek me îro tev mane winda
dema li me hat pêla bayê sar
ji ber wî bayî me bar kir ji war
cîhan bu tarî co tev miçqîn
şikestin ev gul hêvya evîndar
lê îro buhar mizgîn va anî
ji binê çiya derbûne kanî
ewrê li esman ji hev belabû
Mem û Zîn rabûn ji gora Xanî

*FERHADÊ ÎÇMO*

## SÛLAV

sûlav canê ev ro cejne
kovana min ev ro mezne
neya nûye zora kevne
car dibînim car jî xewne
hinda xebat û xwîn û rêç
hema çawa her wa biçêt
yan miletek wekû kurda
bê paytext û sînor bijî
gera herdem ya pir av bît
ma tê çawa zû zuhabit
rêka xwînê kirye zêlak
ma tê çawa zû habît
bela pûr bim nav çemada
nego şêr bim nav rika da
bela bimirin bi bîrna
ne go bimrim ez di dilda
bela tîtik bête sotin
bi gurîka feneroka
ne wekû çik çik û leybit
bijî tim nav kunc û tîka

# YAREK MIN HEYE

Yarek min hẹye bi navê jîne
tor û nazenîn ji min bi kîne
qelenê giran ne bi zêr û dirav
ji min dixwazî tim jî û xwîne

ma ez çi bêjim ko ez razîkim
li çar birê xwe ez gazîkim
ji min jî û xwîn ji bo nêvîkim
li ber pozê min gulek bibîne

bo bîm evîndar ne hat û ne gav
bi ser dilê min bû jana zirav
vegirt hemî can ta dil û hinav
jîna bê evîn bawer ne jîne

dermanê jînê ji bo ez bînim
ko tim bi zana li pey evînim
çendî jê dûrim divê bibînim
ji bo wê bûm Mem himberî Zîne

yara min yare ma ne tim yare
danîşgeha li nav çar neyare
gava nebînim di mînim jare
hêvî ji xwedan ji bo me bîne

*Rêncber*

# NEKE GIRÎ

neke girî û ne lorîne
rondik ji çava ne barîne
ax û keser tu nekşîne
derd û kula ji dil derîne
ma qey çavêt te kanîne
kul û xema li ber diçîne
çava veke û bi meyzîne
çawa felek me dixapîne
jîna te dûman û xwîne
hêsrê çava tu naşkîne
neyar dil kiriye birîne
tijî derdan ne ji vîne
tenê digrî li vî warî
tev razane tu şiyarî
sed mixabin tu nizanî
jîna welat jimer evîne
yara perwer ne lorîne
cerg û dilê mi ne êşîne
feleka reş te nabîne
tuj bo wê ne lorîne

*M. Şêxo*

# DÎSA LI MIN AWIR KIŞAND

Dîsa li min awir kişand
yarê bi wan çavên belek
birca dilêmin hilweşand
ez kirme nêv çerxa felek
çerxê bi fitl û ger û dor
geh birme jêr geh birme jor
geh ez birim Sîpan û Tor
dunya li min kir wek xelek
zulma dikî kes neke yar
herdem bi qêrîn û hewar
wek leşkerê şahê Teter
kirne li dor xêz û xelek
ser sûte geh arişte dil
geh agirê Zerdeşte dil
derya kelek sergeşte dil
mişt û tijî geşt û gelek
ey dilberê dil gawirê
te ez dame ber yek awirê
canê dilovanî bike
zulmê li Tîrêj meke

*Tîrêj*

# EM HEMÎ PÊŞMERGENE

Em hemî pêşmergene
em li xwe pir ewlene

serfraziyê dixwazin
em ne bend û kolene

hey setemkar hey teres
ma heya kengî ne bes

miletê kurd va şiyarbû
tevde jîr û xwendene

roj hilat wa çûye şev
gel hemî dest dane hev

tev dikin kar û xebatê
ew li pey doza xwene

miletê kurd namire
qet ji vê rê nagere

her wekî Tîrêj dibêje
çerx û dewrana mene

*Tîrêj*

# ŞEVA TARÎ

*Bê Buhar,*

Şeva tarî li min reşbû
li ber min rê çi şa bû
gelî kûrin, çiya tev dar
li min barand û baweşbû
nema rihnî dibînim ez
çi sersem bûm çi gêjbûm ez
mi rê winda kirin tevde
di deryayê xemamim ez
nema karim bikim sebrê
ketim ahîn û nav zecrê
hejarî pir li min zorkir
çawa min girt gelo ev rê
gelek wek min di zecrê de
mirin ewna di vê rêda
mirin hindik di zindana
gelek war wan di qeydê da
ev yarê li min werkir
li min barê xeman barkir
felek jî bû neyara min
tevî dujmin bi mir şerkir

# EZ JÎ BI CÎ BIM

Ez jî bi cî bim
ma tim benî bim
di tirsim wer tim lê dayê
bê bask û pî bim

xelk kêf û seyran
tim cê me zindan
mam bask şikestî, lê dayê
bê war û jiyan

ez mame birçî
bê war û bê cî
kesek vê nabê, lê dayê
ma ev ji bo çi

baxê mi kanî ka mêrgû kanî
ka mêrg û kanî
wan tev li mini kir,lê dayê
ev bar giranî

ez bûme bilbil
diljar û bi kul
çi mam Bêbuharlê dayê
dûr bûm ji sorgul

*Bê Buhar*

# ZENGILÊ ZÊRÎ

zengilê zêrî nasik û nazenîn
ter û tolazê yara xwîn şêrîn
bi hatina te gulê gul barîn
xema em xwarin were xwîn şêrîn

bo dilê sotî tu xoş xelatî
tu xweş mêvanî gelek xweş hatî
yarê tu gulî ez belatît kim
çavêt me ron bûn ser çava hatî

wer da biçîne, denga Efrîqa
ji tirsa dijmin zêrêt bi çîka
wer da biçîne Kurdistana min
da qenc bibînî termêd law çoka

yarê buhar hat xemla gulanê
eva buhar hat me zivistanê
yar hizra te me dîtina dostane
yar hizreta me her niştimane

xukujê te me yar Kurdistanê
Sene û Kerkûkê ûAmed û wanê
birêk xistine em dêser kevin

bese koçerî şêrîn canê

bijît yekîtî dermanê kurda
bimrit nakokî dujminêt kurda
bijît serbestî armanca kurda
bimrit zorkarî dujminê kurda

## YARÊ ŞEKIR

Yarê şehkir porê siya
berdaye ser mil û piya
min dî dilê min êşiya
aram û hedanê min nema

yarê ez kirim bend û benî
dema da min dêm û enî
serxweşkirim ez wî kenî
bê hişkirim wek sersema

baxek gulî sê reng didest
mirina min hat yarê neqest
min xwest werê yarê nexwest
yar bû neyara min çima

wê tişt nebê yar bû neyar
lê pişt nedaye min bi car
dawî zivistan bê bêbuhar
lê bê Buhar hêz têne me

*Yûsif Berazî*

# XAL XALOKA ÇEMA

Xal xaloka çema
şemamoka lema
te haj ji xwe nema
pê diket kul û xema

gul yazê lîlozê
lêv şekirê bozê
berê mi da dozê
çidikî dibêhema

çavê teyî spehî
du biskê sê şehî
rondik ji min lehî
hew nas dikin şema

ez xortekî Kurdim
riya gel na berdim
xwînê didim merdim
divêm reqs û sema

Kurdistanam kanî
kê bir û ne anî
rojek wê bê şanî
her tişt dibê hema

(pêt, Dr Fevdulla Xiznewî)

# EY FELEK

Ey felek ka ew sera û birc û qonaxê di min
ka rez û bistan û dar û kanî ew baxê di min

çîçek û nêrgiz herîştin tev ji bîna sorgula
sor perî nayên semayê kanî qozaxê di min

qeb qeb û dengê kewan nayên li ser lat û çiyan
kure kura rengê bûman, naleya zaxê di min

ser bi zêr û çox bi surme dest li ber rû nale nal
dê bikê xweş bin di dilde ev key û daxê di min

bilbilê malik xerab herdem bi hawar û girî
xweş li ser sorgul dinalin, bûne ortaxê di min

qumriyan sed renge awaz wan ji derdê nêrgizan
bûm li ser kax û kelat û qesr û çardaxê di min

dujminbê zordest ûzana tev welat girtin bi zor
erdelan û şehrezû û şax û Kurdaxê di min

kurdê gernas ku şikandin tîp û komên Ingilîz
ketne bin dsetê neyaran bûne al taxê di min

dujminê miletî îro bûne rêber bo welat
yên bi xapan em dixwarin bûne ocaxê di min

ma gelo kevne perestim, na ne raste ezbenî
lê dixwazim zû şiyarbin dost û hev çaxê di min

*Cegerxwîn*

# CANA MIN

Cana min cana min
tuwî êş û jana min
kî zane ez kîme
bê te çiye mana min

navê tey şêrînê
dirûv û nîşana min
dêmê sor çavê reş
bi zav û semyana min
newrozê dîrokê
xelat û Sîpana min

yara dil revandî
tuwî bêrîvana min
destê te bernadim
li ser te fermana min
xweş mêrim xwenda me
qada te meydana min

hevkarî yekîtî
rêç û dibistana min
rêzgarî azadî
evîn û peymana min
hel gurdim ez tême
rabe gulîstana min

*A.Şêx Salih*

# BILINDE BEJN Û BALA TE

bilinde bejn û bala te
li ser taca te esmane
kitanek reng sipî daye
serê zozan û sîpane

li jorê kanî û cobar
wekû hêstir dibarin xweş
li jêrî te dibînim ez
buhuşt û bax û bistane

kirasek etlesên keske
bi reng rojê roje nexşîne
li bejna te dibînim xweş
bi surme û şal û Mîtane

çi reng şêrîne yara min
şepal û nazik û şûxe
Ferat û Dicle û Xabûr
bi ser bejnê de berdane

ji xwîna min tu lêv sorî
ji bîna min gula corî
tenê min bazinên zendên
te zincîrên di lingane

*Cigerxwîn*

# ÇIPKA XUNAVÊ

Çipka xunavê li ser nêrgizê
carek dî hatî nav hoz û kuzê
çavêt reş hibrin li ser kaxezê
yar li te şêrînê li te belengazê

ta kengî bijîn bê vîn û jiyan
ta kengî bijînbê çare û derman
dema awazê vînê me lê da
dê bûm keney şermî û tawan

evîna xelkê şadî û hunere
bo çi evîna me pir şerm û gire
dîroka vînê neşîm ji bîr kim
ji serhatiya ya mişt û pire

xin û xişkokê da bo te bêjim
ez dê gazinda bo te verêjim
ez evîndarim xelkê ez nevêm
ez rastî bêjim yara ez nevêm

qemê dilê min pir vîn û sax key
qemê rondika hişk û zuha key
dergehê jînê ji bo me vekey
şahî û govenda ji bo me karkey

# MIXAB BI NAVÊ JÎNÊ

mixab bi navê jînê
sotim derdê evînê
ma ne bese şêrînê

were şêrînê canê
ji dil derxe vê janê
bela her kes bizanê

ma bo çiye ev evîn
jana wê ku nebê jîn
ey dilbera xemrevînê

tenê tu wî zîna min
armanc û evîna min
wêran neke jîna min

*Sebrî Botanî*

# DIL KEŞTIYÊN AWRÊ ÇAVÊN WÊ

Dil kuştiyê awrên çavên wê
dil girtiyê reş muwên çavên wê
mam şêrîn tam şêrîn dêm şêrîn

li hember min rabe ser xwe weke roj
ji ber sîngê cana min veke bişkoj
nav zirav rû gulav ' ser dirav

yarêz kuştim li min nabê êvar
derman çiye kes nizane bes yar
renge rû tarî mû rinde rû

min dil daye buhayê du sêva
min can daye buhayê du lêva
dev li ken ' lêv û çen ' xweş beden

*Cigerxwîn*

# EZ KEÇA KURDÎ ME

Ez keçika kurdî me
sêva sor û sipîme
xwestiya lawikê partî me
van neyara çi ji me

xwestyê min pêşmergeye
mêrxas û can fida ye
dilê min gelek şaye
ew şerê welatê me ye

kirasê min rengîye
kesk û sor ber sipîye
dilêm gelek şabûye
ewê remza kurdîye

binêr çiyayê Kerkûkê
xemilye weke bûkê
dilêm evîn hilanî
bijî serok Berzanî

ez ji welatê Libnanê
ji partiyê Kurdistanê
xelk û alem tev zanin
çav reş bavê Luqmanin

# KEWÊ XORTÊ SERÊ ÇIYA BÛM

Kewê xortê serê çiyabûm
her bilbilê awaza bûm
dengê cihêlê qenca bûm
mindeng dabû çiya û nehal
xort û lawên min heval bûn
aşiqê dengê zelal bûn
li ber çêla geşe gulbûn
rewneq dabû bask û kendal

rev rev hatin dildarêt me
li dûv deng û awazêt me
jiber hawar û gazinêt me
dîlan kirin cihêl û kal
çiya me li ser awaz xwendî
mêrga me dîlan ra çandî
cergê lawa pê hejandî
îro mame bê deng û lal

bextê weme ey hevalê
ey tolazên pîr û kalê
di wê rojê de em bi al bin
daw jibîr nekin neçit ji bal

# REWŞ CIVAT Û CIHÊLA

Rewşa civat û cihêla
gerdena van bejn kêla
xudena sê pel û pêla
van sê pela civat kêla

rûnişte xwar rîs û çîplaq
şîrê spiya gûzik û paq
ron û geşbûn dîwar û taq
fermiskê berfine pê û loq

rêk û pêk û mist û tijî
berdan ava birc û bijî
xwe lê zîvirand û girnijî got
ezim dilbera mi jî

bibîne so pelava gulya
hawar bû req req tilya
civat bi carkî hil hilya
kesî nema go ne azerya

cihêla destêt xwe hildan
kura li keça çar der badan
bû seyran û çepke lêdan
hemî rexa bû maç lêdan

# EZ Û HIZIR BÛNE HEVAL

Ez û hizir bûne heval
keftîne pey yara delal
li te pîroz bit ew bejn û bal
li te pîroz bit ew çavêk kal

canê derket çû geryanê
pir ca canê derket dîlanê
tên din şenga çavêt canê
diken rek maniya cîhanê

dêm şaneya û xal ketye ser
dêmê vedaye dil veker
awaz şermîne seranser
dê her nalîn her û her

peryêt keftîna serçava
ser kaniya çav û dirava
yêt vedayîne wekû dava
kew gîrêt dil û hinava

canê ji germa ez sotim
canê ji tihna ez ketim
hergav û dem ezê mestim
tc derb mi da neşêm hestim

# EVÎN ŞAHÊ

Evîn şahêt hevala jînê
ev çi bende îro em ketinê
her me da da ji zulm şêrînê
bi rengî dojê sotim evînê
xendiqîn em di xûna medamê
lew dest bernadim ji vê camê
hişta her ezim şahê Şamê
di dilde evîn her tu dimîne
çendî ku ez bigrim ji yara
dildarê kezî wekû mara
ji ber teye ketme ber dîwara
tû min bi hêle carekê ji şahan şînê
çîn' çîn bi şev qiştin xwe berda
biskê herîr di gulavêwerda
da ji min biçin êş û derda
ev reng samane nahêt girînê

# ŞÎRÊ ŞÊRA

Şîrê şêra tu wî tu
şimamoka min tu wî tu
torîna min tu wî tu
hizreta min tu wî tu

hey hawar bo çavêt reş
yêt çandîn nav dêmê geş
jêt firêtin bêhna xweş
ez behnijîm, got û weş

qelawîz dilîzin
ser sîngê di qelizin
bermberîn hin bizin
sermîkî digevizin

xwedana tilî û geha
xwîn dikare xwendingeha
tu rê bidî û bihêlî
ezê dê te xum ha eha

# NEXWEŞIM EZ

Nexweşim ez di evîna te de dil bûye bîhok
pîr û kalim ez dinalim, por sipî bûye gulok
ez li van xan dinalim hêstirên min tên xwar
meyzeke her dû rexan zinarê dêman bûn cîhok
virde çûm wir de çûm wez ketin derya xeman
şaş û cibe min çirandin paşî bûme wek gerok
meyzeke perwane çawa tê te sotin ew bi ar
ew nizanit agire yan pirt û ronak, ya pirtiwa ronak û rok

*Cegerxwîn*

# CIWANE AZADE

Ciwane azade, jibanê bejna wî hinda bi min şêrîne
pîroz bî xemla wî, zavye xêlê wî evîndar û perîne
helbet û tîlî tewînê nay û def, spas û aferîne
al al û binefşin beybûn û bêhna xweş kulîlk û gulbarîne
şalûl û zerîle, tivîlîk û şahînî ji keyFa dil firîne
stêr û xetîre, tîrêj û qozqer, kesk û zer û xemrîne
şiyarbûm konê reş xuya kir hey hewar herim qîr û girîne
winda bû,bela bû, nabînim, kanî ew dilo peykev werîne
hejandim revandim, jana dil, derban û birîna min birîne
mihra wî, bêhna wî, reş tozin, têne dil, birûskê agirîne
efxanim, ranazim, şevê reş nabûrim, xelas nabin çi rîne
seqlanim, şetyanim, dibim ger, ez behrim, şîpêl li min gîrîne
çima hat, çima çû, hê zûbû, kî zanê xewnê şeva borîne
kanî ew ka yê dî, yê dî tir, winda bûn, bê şûn û bê serîne
dinyaye, leylane, me xape bawerke hin dî saxin mirîne
yezdane, tenê her, ew zanî hew bêje bêhna fire zêrîne

E . ŞÊX Sahih

# ÇÛME NAV BAXÊ EVÎNÊ

*Ehmedê Şêx Salih*

Çûme nav baxê evînê
da dilê xwe ez vekim
wê gulê canê şêrînê
got serî dê digel te kim
min perî dîtî li wê rê
ça bi lexşa, rû bi xal
bes bike qet tu wê xêrê
bexçeya taze û delal
mar li ser bejnê kezîne
ser milada hatne xwar
yêt bi bestin çav û rûne
wê dema ser çû hejar
sîng û berbûn mêrg û zozan
wê kirim agir û pel
tazehî bo peykeve çav
min xwezî bo ez digel

# PEYMANA MIN ŞÊRÎN YARE

*Rêncber,*

Peymana min şêrîn yare
gul bişkivîn nû buhare
min dî çavê zelal vekir
bi lêva kenî car bi care

li min neke sergiranî
rabû min dest, stû weranî
divya ji dest min birevî
kula ji dil min der anî

gote tu vîndarê min î
gava got min pêre kenî
bejna zirav xweş xemiland
j' ber ku tu sozdarê minî

destê me lev em meşiyan
berê me ket çol û çiyan
em hatin xwar çûne jorê
gote min hew em westiyan

xema nexwe xem giranî
peymanê yarê ciwanî
xemê di dil tevde hilîn
gava em çûn Kurdistanê

# ŞÊRÎNÊ NÛ GIHAYÊ

şêrînê nû gihayê
li ser min pir bihayê
rabe çaxa xewê ye
bê te xewa mi nayê

dilber çiqas delale
bi hogir û hevale
herdem me dil li bale

şêrîne, gewr û rinde
li havhatî û bilinde
pêçî ji mûm û finde

were carek ji rêva
bide maçek ji lêva
bide min herdû sêva

şêrîn were li ba min
xeman nexwe seba min
were rûne li ba min

*Cegerxwîn*

# TU JI MIN DÛRKET ŞÊRÎN

Tu ji min dûr ket şêrîn
êşê avêt hinavê min
wez birîndar tim dinalim
çimkî tu ne li ber çavê min
hat bîra min ew rojên xweş
min buhurand bi dilkî geş
tim tu bihara dilê min bû
pir kêf xweş bûm bi wa çavêd reş
mi gazî kir dilo rabe
di nav dilade tim xuyabe
çima tu tim kêfxweş nabe
çima gula te geş nabe
limin vegerand ez dinalim
wez birîndarek bê halim
bi ax û hesreta dikalim
ji şêxêre ez evîndarim

*Beşîr Çaçan*

# EYD Û E'REFAT

Gava li me hat eyd û E'refat
roka sibê li me hilat
ew dil û can ji ter kir xelat
ew xeyrî van bi destê miv hat

dil mi bû behra bê binî
tu bû gemye û lê sekinî
te ez hilandime ji binî
evîna me bû serpêhatî

kanî ew sozê te û min
ka ehdê te li ber destê min
te bi kud bir ew dilê min
ew ehd û sozê te nehat

gava tu li ber çavê mi bû
cîhan liber min heyv û robû
gava tu ji ber min dûr dibû
bê te qet sebra min nehat

ka hêlîna me ava kir
xewnê şeva me esas lêkir
bayê ber tavê xerakir
ji serê min bir hiş û mat

# ZEYNEBÊ

Mi bandikir ji dil û lêva lite Zeynebê
biçûkê wek kulîlka nû dikî vebê
cana min mi dilbera bê te tunebê
umrê minî mayî bi umrê te bê
tucar ez têr nebûme ji dêma tey sipî
gulekê serê sibê li ber avê vebî
hîna jibejna tey zirav çavê mitêr nebî
çavê reşî belek ji qudretê dikil bî
tucarî ez têr nebûme ji birh ûçava
te ji mire gotin dikir şekir lêva
te li min dikir dînê wek xewnên şeva
wezê sûnd bixum bi serê diyan û bava
dilêm çax û dema diber min buhûrî
mi digotê niha te bi ser mide vegerî
tid ber min derbasbû teli min ne nerî
dilê min xewirî çavê min sorbûn ji girî
lê belê ji vê eşqê em man bi hêvî
van xelk xêr ne xwaza xwe dane nêvî
em bûne wek keleka dûr bibî ji kevî
nîvê dilêm ma li ba te ez mam bi nêvî

# ÇAVÊT XWE VEKE

Çavêt xwe veke birîndarê min
mêvanê teme kovandarê min
bo min bi axêve evîndarê min
li hêviya teme nêçîrvanê min
şermîn mêvanî belêt di xewnê da
dê min hêlêve gel rojê helda
rêka dildara ji nîv şevê pêda
ne şarezabûm ketme divê şikêda
çira derdê xwe ji mira nabêjî
salê duwazde meh tu herî gêjî
ji dûriyê hatim mêvanim ejî
hilo bi axêve bû dilê tijî
şermîn çavêt xwe ez neşîm vekim
vê pirsyarê şermîn zê ji te kim
ev ser şoyabêt ez dilkî rêkim
kanya çavê te sed pîka pêkim

# NECAT KAKÊ

Navbendî xanêt Bexda û Kerkûkê
qîjya rahêla çelengê xuişkê
qarna û qelatan xwîna lê barî
zordar û xwînmij vêt bimrin xuşkê

çelengiya te Salih gote min
ho necat kaka dayk û xuşka min
cê Leyla Qasim, bi rastî te girt
keça Dihokê dayik û xuşka min

bêje xuşkê xwe rabin şêrînê
xuşkêt qedem xêr û xat û Zînê
Zeyneb, Xat, û Zîn bişkojêt qarane
bo çi hatin kuştin li Kurdistanê

Bo çi helawistin Abid Ebdilah
Tariq, Cemîl, û Şeban Ebdilah
Mehmûd Xelbîşî û mulazim Qadir
Mihemed Şîno ew destkêt gula

Fexrî Zaxolî û Nayif Emîn
gel mela Resûl mêr ser û mêrin
ew xebat karêt wekû Gîvara
xir bûne gorîr û xaka zêrîn
kes dilovaniyêt bi kurda nabit
daxwazê kurda kes çepê nadit
dujmin ji xwîna kurda têr nabit
gurg li nav dehla eve hana ket

# SEBRÊ

Lê lê sebrê
mi go wextê malê me li holabûn
min û bejna zirav soz û qirar bi hev re dabûn
serê berê vê salê ezê nema zanim soz û qirarê bejna zirav,
ne ketin avê ne windabûn

** ** **

Lê lê Sebrê, lê lê berxê, bavo hey bavo
lê lê sebrê migo wextê malê me barkirin ji belêlî belêlo
mi go qasidê xelk û alemê tev diçin û têno
qasidê min û bejna zirav, dêmê du gulî
gulokê berfê, tavê baranê tevde têno

# VÊ YAR KUJÊ TÎREK WEŞAND

Vê yar kujê tîrek weşand
hinav û dil pê herisand
agir bi serda lê reşand
sed bîr bawer hilweşand
dilek nema ku ne livand
kesek nema wê ne civand
bi vîna xo wê ne nivand
wê dil ji pîran jî revand
perde nema wê ne dirand
sofî ji kuncê zîvirand
ji ser û dil îman firand
wek Botanî ew jî xirand

*Sebrî Botanî*

# PERWÎN KEÇA NÛ GIHŞTÎ

Perwîn keça nû gihştî
ew delala xwedê hiştî
çaxa serê xwe li mi hilda
cerg û dilê min biriştî

çiqas bêjim pir şêrîne
keça têra min nabîne
jiber bext û peymanê xwe
du reş mara li min werîne

du reş mar û herdû kezî
min go rabe wê bixwazî
çaxa berê me ket welat
hêvî û gazî li peyme bezî

welatê min sor û şîne
tevde buhara rengîne
hinga midî av û kevî
nûka xweda min mizgîne

em dageriyan çi welate
me ne sebr û ne tebate
mehra dila em hatin mal
qehra mezin ma welate

*Bê Buhar,*

# KURDISTAN PIR ŞÊRÎN

Kurdistan pir şêrîne
tevde mêrg û kanîne
ew buhuşta cîhane
buhuşt xeyrî wê nîne

pênc hezar sal em hebûn
em tevde azad debûn
milet tev bindestî
yek ji me Selahidîne

welato tu pir hêjayî
tu welatê me kurdayî
di cihan de te dengdayî
tu weke find û çirayî

ka wa ka Kurdistanê
ji xeyrî dîn û îmanê
ji te re bibim bi qurban
roja cejna qurbanê

wan darê xox û sêva
bi meşe û buxu bi lêva
kî heye miletê wa
ji xeyrî me kurda pêva

# ŞIVANÊ PEZ DAXIST ÇIYA

Şivan pez daxist çiyê
birî dora kaniyê
bêrîvan çûn pêşiyê
dotin bizin tev miyê

şivan pez anî zinêr
nav kendala rabiwêr
van gîsoka kir kêre kêr
çêran linav gul û giyê

şivan pez anî welêt
nav bexçê tev dar û sêva
berxê biçûk bi ma kêr nagê
pez girtî dora bîrê

pez anî dora bîrê
soz dikir bi wê bilûrê
kotan xwe dan hemberê
pez girtî dora miyê

# LÊ KEÇA TARA BANÎ

Lê keçka tara banî
çav reş ebrû qeytanî
bi xeml û xêza Mîtani

bejin û bala av gulke
por verşî li ser milke
kemberê li ser dilke

cotek gorê Mûşanî heçt rengê neqşê Manî
pêlavek Erzencanî

vê wext û dem û gavê
azad be ji qeyd û davê
qeyd û zincîra bavê

*Tîrêj*

# HER EROM

Her erom erom
dilim elerzî am û za can
lembecê ma we
min gerden berzî amûzcan
am û za tu bala berzî
am û za tu bo min ferzî

li te digerîm
menzil bi menzil am ûza can
min lişwîne dil
dil li şwînî gul am û za can
am û za tu bala berzî
am û za tu bo min ferzî

aşe bextê min
reşî benwênî am ûza can
kê dî we buhar
gul her werînî am û za can
am û za tu bala berzî
am û za tu bo min ferzî

fermisî dilre
berd lê dibarî am ûza can
çûn dilê hîne
ya bê te xwarî am û za can
am û za tu bala berzî
am û za tu bo min ferzî

ASO

Lebanon / Beirout, P. O. Box: (113/5685)